

Dara Sawîrên Tî

Hoşeng Osê

Helbest

Dara Sawîrên Tî _ Helbest
Hoşeng Osê.

Çapa yekemîn _ şam Gulana /2006

Wêneya qabê ya hinermendê şêwekarî Guro ye .

Amadekirina qabê Ebdirrehman Osman.

Hemû mafên çap û belevkirinê ji nivîskar re ne .

Diyarî

Ji bo hemû kesên ku hîna ez wan nas nakim.
Ji bo hinek kesên ku ez wan nas dikim.
*Ji bo giyanê hinermend **SERHED** û dengê hinermend **ŞEYDA***

Di gel hinek xem û xewnên din

Hoşeng

Şivanê Xewnan

Şiva xwe li pişta şevê xe
û keriyên xwe berde zozanên ku ji nalîna bilûra te rijiyane
li ser sînga helbesta "Xanî".
Bera têr biçêrin.
Li ser tayê berbangê
refên sitêrkan razayîne.
Wan şiyar neke. Her sitêrkek, di himbêza xwe de
Pakrewankî dilorîne.

* * *

çemê ji tiliyên te der hatiye
pêlên wî ko bûne.
Ew ên çawa karibin çola bêdengiyê biqelêşin
û xaçerêyekê li nav striyan
ji karwanên sozdaran re bikolin?!
De pencera dilê xwe ji pertavên bîranînan re veke
û destên xwe li qeyika helbstê xe.
Bera li nav ayetên bejna Rozerîn a min û te avjeniyê bike.
Ew bejna tijî girav û bendav
tijî kendav û tengav, gerdûneke dine.
Tê li wê derê, hînî elfebêya xwendina razên wê bibî.
Tê nasbikî bê Xwedê çendîn hinermende
û her hinermendek Xwedayeke.

* * *

Şivano...
Dîrok...
dewran...
zemîn pîr dibin.
Tenê xewnên te ciwan dimînin.
Gelo, ciwaniya xwe ji kîjan kaniyê vedixwin?!.
Dem û xwerist ker dibin
lal dibin.
Tenê xewnên te stiranên kovî ne
Nayên kedî kirin.
Ji misînên elendê, nivîşka temenê te dinoşin.
Te Ji taya têkçûnê şiyar dikin
û li binê perda çavên te radizên.

** * **

Şivano...
Destên xwe têxe paxila hîvê
Misteke ax derîne.
Xunava omîdê li ser birjîne.
Heriyekê di pizdana Adarê de bistire.
bi wê heriyê, nêriyekî ji xewnên xwe bafirîne.
Belkî buhar, çemê payîzê , ji ser paşeroja te vegerin.
Belkî li vî warî, destarê şîn û mirinê raweste
Azadî bizê .
Çav têr ken bibin.
Zik têr nan bibin.
Zarok têr bilîzin.
Şam _ 2001

Çar Gul Û Bendewariyek
Qawaneke ji nav pencên zivistanê
û li nav dojeha berfeke har...
di guhê latekî de kire pist pist:
Buhar dereng ma !?
Ew ê kengî bê, û min rizgar bike.?!
Lat, lerizî
derizî
herifî.
**** * ****
Sosinek li qeraxa hêviyeke kevnar rûniştê

û bi xwe re axift:
Ew ê bê...?
ew ê neyê...!
Bê...?
neyê...!
neyê.
Surra bayekî westiyayî silav da yê
pelên wê yên weşiyayî belawela kir.

* * *

Benefeşkê, raza dilê xwe rijande Ferêt.
ji wî pirs kir:
ev sê hezar sal in, ez li benda wî me...?!
çiyak çû...?
çiyak hat...!
Ezmanek çû...?
ezmanek hat...!
Neteweyek çû...?
neteweyek hat...!
Welatek çû û nehat...!!?
û ew, hîna nehatiye, ku here.
Ez li benda kê me…?!
Ferat şewitî
miçiqî.

* * *

Nisrîneke koçerî, dûrî xwe ket…
li pey leylanê ket.
Bi agir re govend vegirt.
Dema xwest vegere xwe…
xwe nedît.
Mêbûn
reng
bihn
û navê xwe wenda kirin

Çend Guman
Rozerîn…

Çendîn bextiyar im, ku di gulistanên çavên te de
bibim dîlek
û bi qarmeçiyên bijangên te werim lêdan… werim
lêdan
ta ku giyan bidim yezdan.

* * *

Çendîn bextiyar im ku buhara temenê min
di gel çola te were şikestin û guvaştin.
Û bermayên wê
bi arê evîna te were sotin.

* * *

Çendîn bextiyarim ku mîna artêşeke Mîdî
li ber dergehên keleha evîna te dest…
dil.. û ala sipî hildim.
Û li bin serxweşya têkçûnê bi nav bibim wenda
bibim.

* * *

Çendîn bextiyarim ku bi tîrên çavên te
li qiraxa çemên hingivîn yên di lêvên te de diherikin
werim kuştin
werim hiştin.
Bi xunava havînê werim şuştin
Û li nava herdû girên laleşa pîroz
ku yezdan bi hemû hinera xwe
bi sînga te ve daleqandiye
Ez bême binaxkirin.
Rozerîn…
Çendîn û çendîn bextreşim
eger ev hêvî
ev daxwaz
ev xewn pêk neyê……?

18/7/ 1998 *Dirbêsiyiê*

Serxweşiya Dînbûnê

Buhar nû divejiya.
dem razayîbû li ser banê helbesteke qedexekirî.
Di şeveke Beyrûtî de, careke din
ez pêrgî te hatim.
Vê carê, newroz berî dema xwe hatibû
û xwe di himbêza kenê te yê kej de veşartibû.
Tîp, lal bibûn
Gotin, westiya bûn.
vemirî bûn.
Bi elfebêtka çavan, me silav da hev.
Tiştek ji sînga min firiya
û li ser destên te lûsiya û got:
Tu ji çi ditirsî xifşa min ya kovî?!
Ji ser lêvê te yên tenik
kenekî kej û fedyok bişkivî û bersiv da:
ji te li ser te ditirsim .
Ditirsim ev çîroka li nav stiriyan şînhatiye
ew jî berê xwe bavêje.
Dîno……
Mîna ewrim, bê welatim.
Şahinga min...
Evîna min welatê te ye.
Helbesta min paytexta te ye.
Bifire... bifire… bifire…
Lê, sînorê dilê min derbas neke.
Erê dînim…
dînim…
dînim.
Dîn natirsin, fedî nakin.
Bibûre nema karim.
Ez ê biqûrim...
Ji te hez dikiiiiiiiiiim
hez dikim.

* * *

Buhar nû divejiya.
Dem hîna razayî bû li ser banê helbesteke qedexekirî.
Di rojeke beyrûtî de, ez pêrgî te hatim.
Di nav bera ezman, derya û çavên te de
matmayî û wenda bûm…!?

Kîjan çavên te ye, kîjan deryaye…?!!
kîjan çavên te ye, kîjan ezmane…?!!
Ew awazên li ser lêvên pêlên deryayê
bi min re semadikirin, ne sitêrk bûn
dengê te yê şîn bû.
Yên xewin û helbestên min
zindî kirin û kilît kirin, ne şevên beyrûtê bûn
pêjna te ya kej bû.
Min nuh bawer kir ku ez dînim.
De ji ronahiya dêmê xwe û
li ser pelekê ji kenê xwe
Ji dîn ê xwe re niviştekê binivîsîne
û di nava vê hêviya sêwî de min bilorîne.

** * **

Buhar vejiya û keniya.
Demê li ser banê helbesteke kuştî
li xwe û li zivistanê dixist.
Di şeveke Beyrûtî de em pêrgî hev hatin.
Me hev dît?
Me hev nedît?
Ez têr giriyam.
Tu têr keniya û me hev wenda kir.

Şam _ 23/3/2002

Ji bo Neviya Ronahiyê (.....)

Jiyan û cîhaneke din bû.

Pêjna wê ya fedyok
mîna leylanê bû.
Dikeniya û ne dikeniya.
Mîna xunavê dibariya û ne dibariya.
mîna awazeke qereçî ji têlên gîtar ê bireve
ji min direviya
û di nav zeviyên helbesta min de xwe vedişart.
Giyanê min jê re got:
Cêwiya min, xuşka hîvê, neviya rokê
baş dizanî ez kovî me

nikarim xwe kedî bikim û evîna te veşêrim….
nikarim.
Ma çiya bilindbûna xwe ji bîr dike?!
rok ji tîrêjên xwe şer mdike?!
zemîn ezmanê xwe diguhere?!
Ma çem li kaniyên xwe vedigerin?!
Ez jî nikarim. . .
nikarim . . .
nikarim

* * *

Berî sê hezar sal min te li qeraxa Dijle rûniştî dîtî.
Bi nalîna karwanê Stiranên min yên serjêkirî
te xwe dişûşt
û bi bênahiya min, te xwe zuha dikir.
pêlên sirûda Dijle lingên te
yên mîna cama tijî berf û tîn,
talast û maç dikir.
Ba yê tenik û hênik bi serxweşî, wekî semsya zeviyên sinbilan
bi porên te dilîst.
Û ez li bin baranê dişewitîm.
Bi kenê xwe yê hênik
te bîr a Cûdî didrût
û birîna minî kevnare vekirî dihişt.
Ev sê hezar salin
ez li nav kişwera helbestê
ji te re paytextekê ava dikim
û te bi arê bêrî kirinê
temen
liyan
bawerî
û gumanên min cot dikir.
Qîza Xwedê.. bese...!!
Dilovan be bi perestkarê xwe re.
Bese
bese
27/3/2002

Du Sitêrk Û Gîtarek
(……)

Ji rokê hez dikim
ji ber ku ezman dike mîna çavên te.
Ez ê ji Xweda bixwazim, bere bihêle bi roj biçirisim ,
yan ez ê şevê bikujim.
Vê zivistana bêbext
Per û baskên çûkên bîranînan şewitandin
û tiştek ji havînê re nehişt.
Ewê çawa xewa ewran li binê gunehên vê zivistanê bê
da ku bi dizî dakevim zemînê
û bejna stiranên te yên koçerî
bost… bost biramûsim.
Heyv û xuşkên min, biryara min pejirandin:
Yan ew ê şev rengê xwe bike şîn
yan em ê ji wê barbikin.

** * **

Gîtar

Ji konên qereçiyan, ta dergûşa dûmahiyan, li başûrê Xwedê min dest bi ken û giriyê xwe kir
hîna "Lorka" nizanîbû bê qereçî kî ne û çi ne.

Şevê . . . . derî veke…
Li bin siya awazên min
dem û qonax kurt dibin.
Evîndar hev hembêz dikin
Helbestvan dîn û serxweş dibin
Birçî û birîndar radizên.
Li ser pelên nefel û şengebiyan
şevnem şopa dastanên min nîgar dike .

Şevê . . . derî veke
Leylan bi xwe dikene
ku çawa bûye rêberê keriyên çivir, pezkovî û xezalan..?!
Leylan bi xwe dikene
û xwîna Siyamend û Xecê
Mem û Zîn di koka sîpan û damarên cizîra botanê de digiriya.
Li bakurê demsala stêrkan
kew derdiketine nêçîra hev.
Keçên avê, biskên xewnên xwe, bi agir dişon.
Keçên axê, li ewrekî boz siwar hatine

û awazên min, mîna tov, gijlok û pirsan
li ser şûv û çola şevêrkên bêrîkirinê dibarînin.

Şevê . . . derî veke…
Mêvanên buharê, ji havînê xeyidîne.
Havîna par û ya îsal, xêrnexwaz bû
çavnebar bû.
Ev sêhezar sal in, piştî kuştina dîrokê bi şiva şivanekî kurd
nema baweriya tirî û hejîran bi tîn û germa havînê tê.
Erêêêêêêê…..erê…
Hey jaro menal
evîndaro menal
birîndaro menal….
menal.
Di buhara bê de
ew ê dîsa koçer vegerin zozanê giyanê te
û xwîna te, ji xwe re bikin kon.
Wê çaxê…
tê min hilgirî, û li ser têlên min pesnê çavên wan bidî.
Belkî dilên wan, vê carê, bi te bişewite
û te bi xwe re bibin.

Şevê . . . derî veke
Xweda ya dil û nêrgizan dixwaze
derbasî helbesta şervanekî Mîdî bibe.
Pişta xwe daye Cûdî
û berê xwe daye bihna têkçûna Pênûs û gotinan.
Daristan û çem û lawir û firindeyan
li ser temenê wî, dîlok û hêsir dibarandin.

Şevê . . . derî veke
Ez nexweşim.
Nema karim têrî bîranînan biponijim.
Têrî dilan, binalim.
Têrî çavan, bikenim û bigirîm.
Têrî xewn û helbestan, bifirim.
Têrî şadiyê, govend û dîlanan bigerînim.

Şevê . . . bibûre
Min sare…
Derî bigre.

(…….)

Ne mîna te…na.
Belkî mîna buharê
yan mîna bêdengiyê
hingî ji rengê şîn hez dikim
bi roj dimrim
û bi şev divejim.
Ne mîna te…
Belkî mîna xewnan
dilê min dibije koçeriyê
û rêwîtiyeke di gel baranê.
Tenê berbang dikare şopa min bibîne û bixwîne.
Tenê vedenga zingîna zingilan
dizane bizarî vegera min bike.
Na…ne mîna te…
Belkî mîna tenahiyê
yan mîna şevê
yan mîna têkçûnê
Welat dizane, çawa xewnên min
di nav bera min û xwe de par bike.
Ne mîna min…
Belkî mîna birînê
tu weke sitêrkek sêwî
di nav raman, dil û bîranînên min de xwe diçînî.
Lê, weke ez te dibînim
tu min nabînî.
Tu dibînî...???!

Evîndarê Qîza Çiyayê Cûdî

Di şevbuhêrkên zivistanê yên har de…
Dapîra min wisa digot:

Çemê gundê me xwînî bû.
Dema serxweş diket…
Çar zarok bi qurbana xwe dikirin
Û du daristan ji qîzanî dixistin.
Mîna agir dilbijok bû.
Carekê, li kolanên biyaniyê, wî kuştî dîtin.
Û careke din, li gundekî himberî gundê me, peya hat dîtin.

Cara dawî .....
Di nav wêneyên helbesteke kurmancî de, girêdayî hatibû dîtin.
Kûûûr dinaliya.
Kesî nizanîbû bê ji çi? Û ji bo çi?
Yan li ser kê dinaliya.

* * *

çemê gundê me xwînî bû
xezal, pezkûvî, li qeraxên wî nediçêriyan !?
Quling, werdek, kew û kevok, li ser wî nedifiriyan.
Ji ber ku wî, tim û tim ewr dixapandin, ew bi xwe re dibirin dîlana sinbilan û venedigerandin.
Dilê axê bi pêlên wî dişewitî .
Çavên xweristê li razana wî bûn,
Û çavên wî li razana çiyayê Cûdî bûn.

* * *

çemê gundê me xwînî bû.
Ne hogirê bahozan bû,
tenê bûkên baranê ji xwe re direvandin.
Lê, wî ji qîza çiyayê Cûdî hezdikir.
bi evîna wê, welatekî ji dînbûnê,
ji tîbûna kendavên wê
û qebqeba memikên wê re ava dikir.

* * *

çemê gundê me xwînî bû
Dema dixwest bistirê,
Şevek ji ramûsanan
li ser ponijandina sitêrkan dirijand.
şeveke ji tolaziyê
berdida meyxana gotinan.
şeveke ji poşmanî û lavijan
bi pêlên xwe cot dikirin
û bi xemên xwe diçandin.
Bi her kesî re û ji her kesi re dikeniya.
Tenê, bi xwe re digiriya
Tu caran, bêriya gundê me nedikir.

Lê, gundê me, bi qasî çar gerdûnan
bêriya wî dikir.
Bi hezarên caran….
li ber dergehên Cûdî radiwestiya.
Helbestên xwe yên qereçî,
Ji xecxecokên wî re dixwendin.
Bi hezarê caran….
di xewnên xwe de,
qîza çiyayê Cûdî, kuştî didît.
Lewra, her ku serxweş diket
Çar zarok bi qurbana wê dikirin,
Û du daristan ji qîzanî dixistin.

** * **

çemê gundê me xwînî bû.
Digotin:
bavê wî ejdeha bû?!
Û diya wî, dêw bû?!
Digotin: ku buhar, xuşka wî ya ne ji dê bû.
Û payiz, xuşka wî ya ne ji bav bû.
Wisa digotin…??!
Digotin: bejna wî ji jiyanê bilindtir û dirêjtir bû.
Lê, niha….??!!

** * **

çemê gundê me xwînî bû.
Gelek çav
dev…
nav …….
destpêk û dawiyên wî hebûn.
Lê, tenê dilekî wî hebû.
Her sal, berî cejna newrozê,
Dixwaze dîsa vegere gundê me.
Lê, newêre.
Hîna nizane bê wê ji kê lêborîna xwe bixwaze?
Ji kavilan? yan ji dûmanê?
Ji kundan? Yan ji toz û pîrevokan?

Min pirs kir:

Dapîrê… ma çem li gundê me hebû?!
: .. Na, ji ber ku xwînî bû..
…… Xwînî…!!

Dîsa Kenê Çavên Te

Dema çavên te dikenin…
Gotin, wate yên xwe sergûnî buhara te ya dîlkirî dikin.
Xamav dibe mey.
Helbest serxweş dibin.
Li dora bejna te dizîvirin.
Ji gunehên xwe, xwe dişon.
û li ser siya te ya kej, limêj dikin.
Li ber lingên te, ji te niyaz û Lava dikin, lêborîn û dilovaniyê dixwazin.
ji nava kavilên têkçûnê,
mîna kaniyên ronahiyê radiperin.
Hildikşin pêjna te ya ji benefş û laleyan hatiye hûnandin.
Cota kewên li ser zozanê çûn û nehatinê razayîne, şiyar dikin.
Min, li min vedgerînin.
Dikujin
dihejînin
divejînin.
Bi xewneke qedexe, min dipêçin
li ser tîrêjeke sêwî, siwar dikin
û ber bi te ve dişînin.

** * **

Dema çavên te dikenin…
Dîrok xwe dikuje.
Dem, di kêlîkekê de
temenê xwe tîr dike.
Hemû efsane û rastî
hemû pirs û bersiv
hemû despêk û dawî
hemû çiya
daristan
çem
rê
gund
demsal…..
ber bi te ve tên.

Serkêşê vî karwanî, dilê mine.
Karwanê xwazgînên te, ji min re ye.

** * **

Dema çavên te dikenin...
Hîv xwe vedişêre
û şev şermiya xwe diçirîne.
Ez dilerzim
Diderizim.
Dibim keldûmana helbesteke bê xwedî.
Hemû çûkên ji helbesta min, koça dawî kiribûn
vedgerin demsala evîna min û te.
Aso gêj dibe.
Xwe ber dide şikefta şeveke westiyayî
û ez hîna dilerizim
diderizim.
Dem ji bendên xwe azad dibe.
Newroz dibe newroz.
Nû, dibim stiranbêjekî koçerî
Û destana evîna xwe û te
ji çemê Dijlê re dibêjim.
Dibim şivanekî koçer ku li kerî û bilûra xwe digere.
Bêrîvana xewnan...
te dibînim, û xwe wenda dikim.

** * **

Dema çavên te dikenin...
Jiyan dikene, û mirin digrî.
Mirî divejin
û giyan dibarin.
Xwerist dikeve govenda min û te.
Her tiştên qedexe, rewa dibin.
Xewn dibin rastî
rastî dibin xewn.
Birînên min xunava kenê çavên te dinoşin.
Xwefiroşa leylanê...
ta kengî tê welatekî ji rewrewkê nîgar bikî..?!
Ezim welatê te.
Ji paş dûmana têkçûnan

destên xwe dirêj dikim
himbêza xwe, ji te re vedikim
De were...
Ma tu newestiyayî..?!!
De were...
çav
dil
giyanê min ji te re dikenin.

* * *

Dema çavên te dikenin...
Dibim sûlav, ji her devera te kenê xwe
lê belav kiriye
ez kenê te berhev dikim.
Her cihê Pêjna te, tê de derbasbûye, radimûsim.
Dengê te yê belav bûyî
ji bayê û ji hemû guhan, berhev dikim.
Wêneyên te, ji bîr û bîranînên
xelkê dertînim, dicivînim
û ji xwe re vedişêrim

* * *

Dema çavên te dikenin...
Dibim zembîlfroşê te, Xatûna koçeran.
Mîna artêşekî Mîdî, ku cenga xwe wenda kiriye
mîna refekî hêviyên çilmisî, ku li dilopeke ronahî û mistek
axa baweriyê digere
Ez xwe davêjim bextê ol, êl û karwanê te
yan te bidin min
yan min bidin te

11/4/2002

Mikurhatinên Dereng

Na, ne wisa bû !?
wisa bû….
Koçeran, ewrên buharê ji xwe re kiribûn kon .
Keriyên xwe berdabûn zozanên keldûmana xwînê.
Koçeran dilîlandin…

Halan didan Cûdî
da ku çemê Dijlê aş bike
Û berê wî bide Dirbêsiyê
li wir daweta min û te, li dar ketibû .
Lê, ez û tu, ji dil û hestên xwe ditirsiyan û direviyan.

* * *

Na … na… ne wisabû
wisa bû..
Agir, dem li pey xwe kilît kiri bû.
Nîsanê, li ser dêmê elendê
soza kuştina xwe nivîsandibû.
Koçeran, konên xwe firotibûn bayê
û ne ji Cûdî re dilîlandin
lê, ji dûmahiyeke nepenî re.
Dijle, xeyidî bû…
Razayî diherikî.
Razayî dikeniya û digiriya.
Û ez û tu
di xewneke har de,
em xuşk û birayên hev bûn.

* * *

Ne wisa bû?
wisa bû….
Havînê nedihişt em vegerin zarotiya xwe.
Aso ji xwe re
li findekê û du çavên şîn digriya.
Xweristê banî me dikir:
Werin…
Ka werin.. ez ê çîroka vê xwîna fedyok
ya ku ev sêhezar buhare
li ser vê xakê dirije, ji we re bêjim.
Werin binerin, bê şevên havînê
çiqas dilên ter û teze bi xwe re birin dojehê !?
Lê, em neçûn ….
neçûn…
neçûn.

* * *

Ne wisa bû !?
wisa bû….
Evîneke qereçî û gumanên birçî
ramanên te şewitandibûn.
û dilê te hiştibûn ji stêrkan re.
Û ez, ne sitêrk bûm!?

* * *

Na…ne wisa bû…!?
Ez û helbestên xwe sêwî bûbûn
winda bûbûn.
Û tu bû sitêrka vegera me yî bi hev re li konên koçeran .

* * *

Bera weke te be…
wisa bû….
wisa bû.
Lê, ji bilî te jî, hîna hinek dînên din hebûn
ku dilên wan, dibijiya xewê
li bin konên koçeran.
Û ji bilî min jî, keskî din tune bû ku helbestên te ji wa re bifirre.
Ma.. ne wisa bû??
Wisa bû.

Şam _ 2 /2 / 2003

Nameyek Lezgîn Ji Do re
Pişti silavan……
Tu çawa yî?
Ma tu hîna wekî xwe yî?!

Sibe na dusibe…
mîna cejneke ji gewriya xwe birîndar be
ji xewê bîstikên şîn pars dike
ez li virim.
Her êvar, serê xwe datînim ser çoka rewrewkê.
Biqasî çar goristanan, razayî diramim.

Biqasî çar payizan, xewnên min, min dimêjin.
Bişkokên şevê, yeko….yeko
ji têkçûnên xwe û te re vedikim.
Berî gencîneyên te, sitêrkan, morî û zîvên wan talan bikin
li ser pêjna min ya li qeraxa wateyan westiyayî û matmayî birijînin.
Berî ku Adar tola xwe ji Eylûlê bistîne.
Hîna xwîna helbestê germe
ew xwîna ku berî limêja şeveqê ji sawîrên Xwedayên basik şikestî hatiye sitandin .
Sawîrên Xwedê û yên Kurd û kew û kundan yek in.
Lê, sawîrên kewan bi yê kurdan ve kilîtkirî ne.
Lewra, axê sozdaye ku sibe na dusibe, tola agir ji avê bistîne.

** * **

Sibe na dusibe…
Mehrecana mirina havînê ye.
Hejîr û tirî sêwî bûne.
Kuştiyên peyvên fedyok
mîna berfê, li ser tayê dumana dilbijokiyê, rêwîtiya xwe berdewam dikin.
Li bin siya awazên genim û pembo, gunehên hev dijmêrin.
Di nav bera çar mirinan de, sitiraneke bi stiriyên şîn, bo te dibêjin.
Stiranên bi strî… Welatên bê peyv û heyvin
awazên bê dengin
xemên meyandî ne
û pencereyên ji xewnên firindeya re vekirî ne.
Di stiranên bi stirî de…
Bihn bi zimanê rengan taxivin
û reng bi zimanê giyanê şervanekî Kurd, digirîn û dikenin.
Li ser sosreta çemê ku di himbêza bakurê xeman de razayî
taxivin û digrîn .
Bakurek heye…
Di nav bera têkçûnan de rûxiyaye.
Bakurek heye, di nav bera çar başûran de derizîye.
Bakurek heye, kêla goristana xwe ye
ala serhildana xwe ye
hogirê xwîna xwe ye
tolhildêrê peyva xwe ye.
Başûrek heye…
Dengê xwe ji pêjna xwe nasnake.
Başûrek heye, xwekujê xwe û agir e.
Başûrekî din heye…

Bakurê xwînê ye
Pîrozgehê dîna ye
birayê sê xwişka ye
xuşka sê bira ye
dotmama sê hezar kewa ye
Pismamê sê hezar şoreşa ye.
Ne li wî başûrî
li başûrekî din, li hêviya te me
sibe na dusibe.
* * *
Sibe na dusibe…
Salvegera sê hezaremîn ya kuştina min e.
Û hîna dem û cih, li kêla min digerin.
Ez jî…
Li ser pişta "demilqeran"
li pezkoviyê ku ez kuştime digerim
da ku lêbûrîna xwe jê bixwazim.
Berî ku Sîpan tewana xwe, bi qêrîna Xecê bipêçe
û bi şûrê zivistanê
bîranînên xwe û yên payizê bikuje.
Rûwê min, mîna qulingekî sêwî
li nav kolanên tenahî û mişextiyê wenda bûye.
Gewriya min…
Bûye dergûş û hêlana peyvên nepenî.
Peyvên nepenî…
Lavijên poşmaniya Xwedawenda ne.
Peyvên nepenî û bihna kenê te, cêwî ne.
Cûdiyê ku di newqa Dijlê de
çar hezar birîn bişkivandiye
soza kuştina Dirbêsiyê daye Dêrikê
sibe na dusibe.

* * *

Sibe na dusibe
Ezmanê heşta sayî ye.
Giyanên sor…
Bêy ku soza vegerê bidin, bê xemên zemînê jixwe kin
çûne nêçîra ponijandinên hîv û çûkên Cotmehê, li ezmanê pêncan .
Giyanên şîn…
Razayî, lavijan dixwînin

û gunehên hev dijmêrin.
Dixwazin tolaziyên xwe, bi ezmanekî ji girî pîne bikin.
Giyanên kesk…
Tinaz û qerfên xwe, bi pîrozmendan dikin.
Xweziya xwe, bi gunehkaran tînin.
Ji giyanên sor şerm dikin
û dijberiya xwe bi giyanên zer re berdewam dikin.
Giyanên sipî…
Tenê ji havînê ditirsin
û ji adarê fedî dikin.
Giyanên zer…
Ji du tiştan hez nakin
Ji rengê xwe û ji tenahiyê.
Nifiran li wê roja ku Xwedê
wan tê de zer kiriye dikin .
Sûnda kuştina Xwedê xwarine.
Lwera, her payîz, li ezmanê duduyan, kozik û çeperên xwe vedidin.
Giyayên zer, çavnebar in.
Dijatiya giyayên kej û yên şîn dikin.
Giyanên kej…
Hîna koçer in.
Li nav ezmanan, ji stiranên xwe re, li welatekî biqasî çar bihostan,ji kenê qurnefilan, digerin.
Hîv û rok, nikarin pesnê ronahiya xwe bidin
dema ew difirin.
Carna, dibin ewr û carna, zingil.
Carna, dibin cejna binefş û perperîkan.
Û carna dibin her tişt, ji bilî xwe.
Giyanên kej…
Serwerên giyanên reng û denganin .
Di ser pireke ji hêviyên miriyên çav vekirî re ,
miriyên çirûsk û pertewan, derbasî buhuşta xwe dikin.
Miriyên bê gor
di gel Tebax û Tîrmeh ê seyranê dikin
û di gel mijdar ê, li ezmanê yekem, Sibata par dilorînin.
Giyanên reş…
Evîndarên ronahiyê ne.
Helbestên xwînê yên bê tîp in.
Sawîrên zeytûnan,mîna alê hildidin.
Zagon û yasayên şevê, binpê dikin.
Gunanên Xwedê, bi tenahiya wî har dikin.

Û kişwera şahê cinnan, li ezman ê heftan , ava dikin.
Ne tenê xewnên sipîndarên kezîkur û şengebiyên perîşan û bextereş , şirove dikin.
Lê, yên welatê mirinê jî, ew ê sibe na dusibe, şirove bikin.

* * *

Sibe na dusibe…
Şîna tîpên serhildêr
li ser koçkirina welêt ji helbestên xwînê, bi dawî nayê.
Helbestên xwînê û helbestên agir
keçên xemgîniya axa Mezobotamya ne.
Helbestên xwînê…
Ji saw û sawîrên kew û pezkoviyan hatine hûnan .
Helbestên xwînê…
Demsalên bin avbûyî, li bin pêlên dînbûn û zaroktiyê ne.
Helbestên xwînê…
Mikurhatinên xwê ne, li pêşiya pêjna min û te ne.
Li ezmanê heştan, sibe na dusibe, tê dubare bike.

* * *

Sibe na dusibe…
Bawreiya min bi min û te û sibe
nema tê.
Hema îro were..
ne sibe na dusibe.

10/6/2003 - şam

Siwarê Tîpên Bêcir
(Ji bo helbestvan Kemal Necim)

Hogirê toz û mijê…
Tu bi xwe re, çima li hev nayê!!?
Kes weke te nîn e.
Û tu ne weke xwe yî jî.
Mîna Xwedayekî wendayî
di nav bera dil
tenahî

bêdengî û xemên xwe de.
De bajo….
Hino ..hino bajo
Giyanê te yê şikestî, ne tiyê firrînê ye.
Lê, dixwaze li bin siya zeytûnekê razê.
De bajo…
Berî razên helbestên şîn
Qîzaniya xwe bifroşin qirala cinnan, bi misteke xew.
De bajo…
Berî çavên kezîzerê
ji liyan û xewnên te birevin.
Çavên kezîzerê û barana kesk, cêwiyên rewanê te bûn.
Heft hezar çîrokên şevên zivistanê
di bîstikeke fedyok de dimeyandin.
Û heft hezar şevên har û kovî
di çîrokekê de diwestandin û dilorandin.
Lê, berî oxira dawî, te ji nêzîk ve li wan çavan nenerî!?
Te li çi dinerî?!
Li xweliya tirsê
ba yê têkçûnê
li hemû destpêkên bê dawî
hemû dawiyên bê destpêk, dinerî ?!!!
Siwarê birînan…
Hemû raperîn, artêş û keştiyên te
li ber dergehên Efrîn ê xwe şewitandin.
Ji ber ku tu ne mîna helbestên xwe jî bûyî.
Birastî nizanim….
Bê çawa ew tîpên bêcir
û gotinên serhildêr xwe dihûnin
û rişma xwe didin newêrekekî weke te?!
Raste tu dikarî şevê bi tîrêjekê girêdî
û bi dilopek xem bişweitînî.
Tu dikarî li ser vedenga tavên Beyrûtê demsala ramûsanan nîgar bikî
li ser pêlên deriya wê
mîna pêxemberan bimeşî.
Tu dikarî buharê di paxila payizê de bilorînî.
Lê, nizanim bê ta kengî
ji têkçûn û tirsê re bijî ?!
Tu dizanî çawa ji perestgehên xemên xwe ken biweşînî.
Lê, tu nizanî mîna helbestên xwe bigirî?!
Siwaro… de bajo..

Bajo ber bi cîhaneke ji girî ve.
Giyanê xwe ji tirsê daweşîne.
Kî dizane bê kezîzer û kezîreş
di kîjan dojehê de li benda te ne?
Rapere li himberî xwe.
Berî tîpên bêcir
rişma hespên xwe yên şemûs ji te bistînin.
Carekê tenê, bibe weke xwe û bajo…
bajo…
bajo…
bajo…
Berî deriyên poşmaniyê werin girtin.
Dadgeha dilan, li gunehên te yên ku gerdûn nikare wan hilgire
ew ê bibûre.
Hey raza bê xew, û xewa bê raz.
Karwanê telsemên xwe bajo
ber bi wan ve.
Hey wendabûna kilîtkirî bi wendabûnê…
Çavên wan kilîta razên te ne.
Çiyan, li bahozan napirsin û natirsin.
Mij, nabe hêlîna çûkên baweriya te ya bi te leriziyayî.
Dema Zembîlfiroşan bê veger çû.
Û pencera kezîzerê hîna vekiriye.
Ji xwe nereve.
Li xwe vegere.
Yan bersiva min bide…
Ta kengî ew ê newêrek karibin helbestên wêrek bihûnin..?!!
De bêje….
bêje?

Zingilê Evîn û Birînê

(Ji bo şehîdê hozanan û hozanê şehîdan pakrewan SERHED).

Dema tiliyên te ramûsan didan têlên tenbûrê
hemû demsal diherikîn.
Pêlên ji ken
Pêlên ji girî
û pêlên ji keserên kûr
û mijûlbûn û ponijandinên sor diherikîn.
Şev, dibû hêlana xewnên qedexe.
Şev şil dibû zuha dibû.

Dîn dibû …mest dibû
wenda dibû…diyar dibû
diyar dibû… wenda dibû.
Li bin siya awazên te yên hênik
evîn
welat
azadî
û hêvî dibişkivîn.
Di wê demê de min nas kir
ku yezdan, hemû zingilên xwe
di gewriya te de veşartibû.
Min nas kir
ku surra ba yê serê sibê
tenikbûn û nazikbûna xwe
di zelalbûna dengê te de guvaştibû
meyan dibû.
Di wê demê de min nas kir
ku tenbûra te tifinga te bû
û tifinga te tenbûra te bû.

** * **

Kesî nizanîbû bê te soz dabû kê?!
Dotmama te ya Mîdî…
Ji şaneşîna zivistanê
li Sîpanê Xelatê dinerî
û bendewara te bû
ku tu mîna hîveke ji stiranan
ji serê Sîpan bigindirî gola dilê wê.
Yan mîna dastanekê tu werî
û dawiyeke bê girî hembêz bikî.
Yan mîna çemekî ji perperîk û sitêran
biherikî û buhara wê av bidî.
Lê, tu nehatî ??!
Newroz li ber dergehên Adarê westiyabû
Li benda te bû
da ku tu zivistanê kilît bikî
û sirûda payîzê vemrînî.
Lê, tu nehatî??!!
Gola Wanê
Keleha Farqînê

Meydana çarçira
Amûda bavê Mihemed û Dirbêsiyê , birîn û bîranînên te dicivînin.
Bi xunava giyanê li ser dêmê elindê ,
herdû çavên yara te şêwe dikin.
û ahengeke ji keskesoran
ji bo hatina te dihûnin.
Lê, tû nehatî??!!
Hewlêr bi awazên te, xwe xemilan dibû.
Keriyên xezalan…
Refên çûk û bilbilan…
Kerwanê soz û doz ê
Zap û ava şîn
û hîva şevêrkên havînê
tev bi hevre govend û dîlan û sema girtibûn
û li benda te bûn
Lê, tu nehatî …
nehatî…
nehatî…??!!
Kesî nizanîbû ku Beko di heman demê de li nav kolanên Hewlêr û Cizîra Botan digeriya
û kîna xwe bi diranên gurên boz tûj dikir.
Kesî nizanîbû bê feleka pûşt, li ser rêya hatina te
konê bêbextiyê vegirtibû
û zeviyeke ji xefkên bi jehr çandibû.
Hewlêr, xwe avêt himbêza Cûdî û qûriya
giriya. Kevanên keskesorê şikestin.
Şevê, bi şûrê ziviztanê xwe kuşt.
Helbestan, xwih didan.
Nema zanîbûn bê çawa ew ê
xwe bi dawî bikin.
Awazên te, îro sêwî bûn
Sitiranên te bûne ewrên kesk
li ser dojeha ku barkirina te, di dilê me de vêxistî
deryayeke ji aramî barand.
Lê, dojeha venemirî ?!!.

** * **

Ez li ser bihna her gulekê, te dixwînim.
Di nav pêlên fîxana her bilbilekî de ,
li nav xemgîniya her dildarekî ,

kenên her zarokekî ,
lorîk û dîloka her dayikekê de
ez te dibînin.
Her ku newroz li dergehên Adarê dixe , di stiranên te de
ez maçî yar
welat
azadî
û Xwedê dikim.
Nikarim… nikarim.. nikarim.
Nikarim bêjim Oxir be.
Yan li me vegere?
Yan min bibe gel xwe.

Tirs

Şeveke dîn…
Dadikive pişika pênûsa min.
Min bi xîzxîza kuxikê şiyar dike.
Çavên sirûda xwîna min kil dike.
Û li bin sîya birîneke kevnar radizê.
Hîva şermok…
Zîva xwe dilop
dilop berdide peyala min ya tijî xew .
Li qorziya bîranîneke dûr…
Pêjneke tazî li hestiyên evîneke binaxkirî rûniştiye.
Dikene…!!
Min bi aliyê xwe ve dikşîne..!!
Lê, ez ditirsim ji do?!
Tînim bîra xwe …? tînim bîra xwe…?
Ev çavên ku di ezmanê xwe de
çendîn ezman guvaştin
ne biyanîne?!
Ev lêvên di hingivê xwe de
stirana tirî meyandine
ne biyanîne?!
Ev sêvên tijî çîrok ku çawa tilyên min vedixwînin
çêrandinê li nav mewîjên xwe
ne biyanîne?!
Ev porên zêrîn, ku mîna aso yên ji sinbilan diçirisin
ne biyanîne?!
Tînim bîra xwe??
Tînim bîra xwe??

Lê, ez ditirsim…!!?
Ditirsim…!?
Ditirsim ji do.

Şam .. 20/12/2000

Dastan

Hebû tunebû… hebû ez û tu.

Min ji te hez kir.

Te ji min hez kir.

Welat ji me hez kir.

Lêêêêê…

Beko hebû…Beko.

Kilît

Sitêrvanekî, birîneke min xwend, û got:

Despêka te, bêdawî ye.

Helbesta te, hişk û tî ye.

Xewna te lal û sêwî ye.

Arê dilê te vemirî ye.

Kilîta birîna te...

di demsala pêncan de

ji salek efsaneyî wenda bûye.

Gotina Kuştiyekî

şev bênijî...
porên te, za.
Hîv keniya...
dêmê te, za.
Elendê xwe meyand
lêvên te, za.
Ezman xwe guvaşt
çavên te, zan.
Hevirmêş û berfê, hev hembêz kirin .. ramûsan dan hev
bejna te, hûnandin.
De bêje…

bêje…
bêje...
çawa ezê ne kuştiyê te bim, lêêê...!?
çawa ezê karibim evîna te veşêrim
... çawa...!?

18/3/2002

Bang

Pênûseke zarok qîriya:

Gelî tîp

gotin

helbest û xwendevanan

Gelî çûk

demsal û daristanan

Di vê avdarê de

dilê çemekî penaber hatiye dizîn.

yê ku dîtiye

yan biriye

yan diziye

pîroz be li wî û sipas jê re.

Tenê, bera ji helbesta (serxweşiya dînbûnê) re bêje.

Şamê got: li gel min e.

Bêrûtê got: ew li gel min e

Dêrikê got: li gel min e

Dirbêsiyê got: li gel min e

Pêxembera viyanê û neviya ronahiyê keniya û got:

Na... na, ew li gel min e.

Bîstikek Li Bin Baranê

Li devera ku wateyan lê dest bi sitirana xwe dikir
Te kuştina min, bi dawî kir.
Cihê ku wateyan lê rêwîtiya xwe bi dawî anîn
Min dest bi giriyê xwe kir.
Nema zanim kîjan adar bû?
kîjan adarê, hatim kuştin..!?

* * *

Hisssssss…
Ji baranê re nebêje:
Pişti sê hezar adaran
ezê werim cejna memikên te pîroz bikim.
Ji ber ku baran dizane.
Lê, ewr hîna nizanin.

Peyvek Şîn

Di gel çûkan radıza.
Di gel xewnan şiyar dibû.
Di gel bêdengiyê, şev vedixwar.
Bi qasî biharekê dikeniya
û bi qasî ezmanekê digiriya.
Carna dibû govendek di gel agir.
û carna xewsivik û newêrek bû.
Di gel mirinê rêwîtî dikir.
Di gel min, her êvar, dihat kuştin
û di gel helbestê divejiya.

Şam 7/2/2003

Du Tablo

Bi hev re û di demekê de
helbesta min, li ser bêdengiya şevê
vedenga kenê te yê kej dikola.
û evîna te ya efsaneyî, bi dizî ,
bi agirekî kesk, di dilê min de, ji bo xwe buhuştek
û ji bo min dojehek har dikola.

1 / 4 / 2002

Mistek Pirs

Ji çiyê pirsîn:
Tu çawa bûyî çiya ?!.
Çiya got: Min ji ezmên hez kir.
Ji çem pirsîn: Tu çawa bûyî çem ?!

Çem got: Min ji deryayê hez kir.
Ji sitêrkê Pirsîn:
Tu çawa bûyî sitêrk ?!
Sitêrkê got:
Min ji Şevê hez kir.
Ji min pirsîn:
Tu çawa bûyî helbestvan ?!
Min got: ji ber ku min ji te hez kir.
4 / 4 / 2002

Pirseke sitewr

Welatek li xwe digeriya

Pakrewanek dît.

Jê pirs kir:

Ez li kur bûm?!

navê min çi bû?!

Pakrewan got:

Dema min xwîna xwe li ser

xaka te rijand, min got:

bijî Kurdistan.

Vexwendineke Din

Tê werî...?
Dîsa weke her car
em herin, xwe di qorziya şevê de veşêrin.
Findekê bi evîna xwe vêxin.
Şeveke din, bavêjin ser xwe.
Sitêrkan li ser dêmên hev biçînin.
Guliyên te vekim ji xewneke qereçî re ku
Xewê pars dike, û difroşe demê. Destên te yên tî û serxweş
di nav govenda razên min de
li kaniya jiyanê digere.

Lêgerîn

Çiyak, ji quntara xwe re
li dumahiyekê digeriya...
çemek dît.
Çemek, li dawiya xwe digeriya...
deryak dît.

Deryak, li despêk û peravên xwe digeriya...
asoyek dît.
Asoyek, li despêk û dawiya xwe digerya
çavên te dît.

(…….)

Cîhan li bin pencê demek zingarî razayî bû.

Li pêşiya çavên felekê

dizê şadiyê, di bewqa rastiyê de

bahozek jehr çand

û gelewêja min ji ser sînga berbangê dizît.

Şama (şerîf) dikeniya û digiriya.

Li çepkan dixist

û li xwe dixist.

Sirgûn Û Evîneke Din

Kolanên Şamê gavên min dicûtin.
Bayê wê, temenê min dimêt.
Di nav bahoza hilweşandinê de
çirûskên şîn xwe li cama pencereya tenahiya min dida.
Xewnên zaroktiyê şiyar dikirin
û ez mîna firindeyekê vêxstim.
Ji wê kêlîkê ve, min xwe dît
bê çawa ji paş dumahiyan ez têm.
Xaça min li ser milê min e.
Li nav kuştar û zeviyên qedexeyan dimeşim.
Min dilê xwe berî xwe ji te re şandiye.
Li hêviya min be
va ez têm
ez têm
têm
têm .

Diwazdeh Şîretên Xwînê

_ 1 _

Li paş xwe nenere..!

razek tê kuştin.

Demsaleke fedyok û çemekî dilbijok, têne dardekirin.

_ 2 _

Ranezê...
Berî ku tu pencereya dilê xwe
ji bayê re vekî
û giyanê xwe bi axê kilît bikî.

_ 3 _

Eger di rêwîtiyê de barên te peyv bin?
Bera sor û şîn bin.
Û li wateyan nepirse.

_ 4 _

Tu êzing î...
Hayê ji agir neyne.
Nebêje : ew ê av bi kêrî min bê...!?

_ 5 _

Di beşdariya helbestê de
bi gotinan nelîze
û dengê sawîrên xwe yên toalaz nebhîze.
Da helbest, qîzaniya xwe wenda neke.

_ 6 _

Dilê xwe nebijîne mirinê...
Ta taseke dew
misteke mewîj
nanekî tenûrê
û du çavên şîn li ser çiya hebin.

_ 7 _

Tenê ji xweristê
tu dikarî hînî azadiyê bibî.

_ 8 _

Li her dû cîhanan
her ku zivistan pêrgî payîza temenê te bû
şîreta çar a, sê hezar car bixwîne
û carekê tenê pêk bîne.

_ 9 _

Ji genim û xwê hez bike
Lê, ne ta qûnaxa

ku desmêja sinbilan bişkînî
û deryayê bixeyidînî...?!

_ 10 _

Her ku xemgîn bû
mişextî
tenahî
hêlînên xwe di giyanê te de vedan
rahêje pênûs û bilûrê.

_ 11 _

Ji ber ku tu jî
ji zarokên vî ezmanî yî
ji çûkên vî agrî yî
ji sitêrkên vê avê yî
min ev şîret ji te re gotin.

_ 12 _

Guh nede şîretên ba yê
û ne yên min jî.
Tenê şîretên ronahiyê pêk bîne.
Şam _ 2003

Naverok

Şivanê Xewnan .....
Çar Gul Û Bendewariyek .....
Çend Guman .....
Serxweşiya Dînbûnê .....
Ji bo Neviya Ronahiyê (....) .....
Du Sitêrk Û Gîtarek .....
Evîndarê Qîza Çiyayê Cûdî .....
Dîsa Kenê Çavên Te .....
Mikurhatinên Dereng .....
Nameyek Lezgîn Ji Do re .....
Siwarê Tîpên Bêcir .....
Zingilê Evîn û Birînê .....

Tirs ……..

Dastan ……..

Kilît ……..

Gotina Kuştiyekî ……

Bang ……..

Bîstikek Li Bin Baranê …….

Peyvek Şîn ……..

Du Tablo ……..

Mistek Pirs ……

Pirseke sitewr ……..

Vexwendineke Din ……..

Lêgerîn ……..

(……..) ……..

Sirgûn Û Evîneke Din ……

Diwazdeh Şîretên Xwînê ……

Pertûkên helbestvan yên çap bûyî evin..

1- pêxembera evînê , perkeşteya birînê ye. / helbest - erebiye şam .. 2001

2- Rewanbêjiya Şîno . / helbest - erebiye / şam .. 2004